HELLENIC REPUBLIC
Ministry of Interior and Administrative Reform

Asylum Service

Pêşqeydî:

Di dawiya meha Gulanê û di dawiya meha Temuza 2016ê de, komek ji xizmetên penaberîyê serdana wî cihê ku koçber û biyaniyên li Yewnanistanêne kirine. Di vê demê de, hûn karin li ba rayedaran ji bo mafê penaberiyê li Yewnanistanê an jî her bijareyekî din ku ji bo we heye bixwazin. Ev prose wek "pêşqeydî" tê binavkirin.

Hûn ne mecbur in pêşqeydîyê bikin. Mafê we yê hilbijartinê heye. Lêbelê, pêşqeydî ji bo daxwaza mafê penaberiyê li Yewnanistanê pêngava yekê ye , lihevcivandina bi malbatê an veguhestinê ye.

Ji bo hejmara mirovên karin pêşqeydîyê bikin tu sînorek tune ye. Cihê ku hûn lê dijîn çi bandoreka xwe li ser dema terxankirî ya pêşîyê ji bo hevdîtina we tune ye. Ji ber vê, dibe li cihê ku hûn niha lê dijîn bimînin, ji bilî ku dewlet ji we bixwaze hûn veguhestinê bikin. **Eger hûn bixwe bi rê ve biçin cîhên din, divê ku Xizmeta Penaberan, pêşqeydîya we rawestîne. Derfet her kesekî ji bo pêşqeydîyê heye!**

Sebir bikin û rêzê ji destûran re bigirin. Di rewşa hebûna tundî an kiryarên şidetê de divê ku Xizmeta Penaberan, pêşqeydîya we rawestîne.

Hûn karin li ku dere pêşqeydîyê bikin:

Xizmetên Penaberîyê dê li hin cihên fermî ji bo tomarkirina penaberan hinek navendên demkî veke.

Ger hûn li yek ji van deran da dijîn, dê pêşqeydîya we li cîheki ji wan deran were kirin.

Ger hûn li cihekî fermî dijîn, hûn ê ji nêzîktirîn cihê pêşqeydkirinê bi otobûsê bên veguhestin. Piştî vê jî, dê otobus we lî cîhê jîyana we vegerîne..

Ger hûn li gundekî an bajarekî li derveyê van cihan wek nimûne; di apartmanekê de an hotelekê de dijîn, karin, bi tenê ji bo demeke sînorkirî di nîvê meha Temûzê de li Atîna û Thessalonikê pêşqeydîyê pêk bînin. Di nêz de dê cîhê vê yê rastîn bê eşkerekirin. Divê hûn bixwe herin wê derê. Herwisa hûn dikarin bi rêya Skype-ê, proseya pêşqeydîya xwe dewam bikin.

Di heman roja pêkanîna pêşqeydkirina we de, dê karta penaberîyê ji we re bê pêşkêşkirin, ku ji we re derfetê dide heta dema ku biryara dawî li ser daxwaza penaberîya we diweşîne, bi awayekî qanûnî di Yewnanistanê da bimînin.

Eger we niha kartên penaberîyê heye, ne hewce ye ku hûn pêşqeydîyê pêk bînin!

Gava 1ê Amadekarî

- Yek an jî du rojan berî destpêkirina pêşqeydîyê ji bo kesên ku li herêmê dijîn, dê komeka piçûk biçe wê derê. Ev ji bo alîkarîdana amadekariyên pêşdibistanê û bersivdana ji pirsan re, li herêmê amade dibin.

- Eger hûn bixwazin pêşqeydîyê bikin, divê hûn û hemû endamên malbata we, di rêzikekê de bisekinin da ku bazinek ji were ra bê pêşkêşkirin. Hemû endamên malbatê, divê ji bo vî karî kom bibin. Li ser vî bazinî hejmarek, bar kodek û roj û dema pêşqeydîyê hatiye tomarkirin. Radestkirina vî bazinî bi tenê ji bo vê ye ku zelal bike ka kê we di çi demekê de ji bo pêşqeydîyê navê xwe tormar kiriye. Ji bo pêşqeydkirinê ev bazin divê, vî ji xwe dûr nekin!

- Di hinek bajaran de divê hûn hinek mirovan bibînin ku bazinên wan ên rengên cuda hene. Rengên cuda ji bo cîh û rojên cûda ne ku xelk hatine pêşqeydîyê. Tu maneyeka din ji bo van rengan tune ye.

HELLENIC REPUBLIC
Ministry of Interior and Administrative Reform

Asylum Service

Gava 2yê Têketin

- Hûn ê ji cihê pêkhatina pêşqeydkirinê bi otobusê bên veguhastin bi vê dere ve.. Divê hemû endamên malbata we li otobûsê siwar bibin.

- Dema ku hûn biçin cîhê pêşqeydkirinê bila hemû belge û dokumentên we bi we re bin. Wek nimûne: paseport, nasname, belgeya zewacê, ehlîyeta ajotinê û ya herî girîng jî **nivîsara xwe ya polîsî**. Dema ku prose dest pê kir, ui belgeyên ku we ji bîr kiribin, dubare nayên qebûlkirin.

- Bi xwe re rêr an jî tiştên din ên xeter neynin. Parêzvan di navenda pêşqeydîya we de bi madengiê bikolinû dê tiştên xeternak ji we bistînin.

- Her dema ku hûn gihîştin, divê biçin odeya rawestanê. Hemû endamên malbatê divên bi hev re bin. Li odeya rawestanê, hinek karker hene ku bersiva pirsên we bidin.

- Kesek, bazinî û hebûna nivîsa polîsî kontrol dike. Eger teşqeleyek hebe, ew ê we bişîne ba yek ji endamên koma me da ku çareyekê peyda bike.

- Li roja pêşqeydîyê, dê ji bo hemû kesan av bê pêşkêşkirin. Hûn ê bi tenê çend deqîqeyan ji cihê xwe dûr bikevin, lê eger bawer in ku pêdivîya we bi xwarinê yan jî alavên din (şîrê zarokan, û hwd) heye, wan bi xwe re bînin.

- Dema hûn diçin odeya rawestanê, sê bijareyên we hene:
  - Bijareya 1ê: Eger we daxwaza penaberiyê li Yewnanistanê heye, dixwazin ji bo dubaredîtina yek ji endamên malbata xwe ku li welatekî din ê Ewropayê da ye daxwazê radest bikin, an eger dixwazin ji bo veguhestina li welatekî din ê Ewropayê daxwazê pêşkêş bikin, divê hûn li bendê bimînin heta ku bibe dora we û biçin odeya pêşwazîyê.
  - Bijareya 2yê: Eger hûn naxwazin daxwaza penaberiyê, daxwaza dubaredîtina endamên malbata xwe an daxwaza veguhestinê pêşkêş bikin, lê dixwazin agahiyan li ser vegera li welatê xwe an tomarkirina ji bo vegera welatê xwe wergirin, divê serdana Rêxistina Navnetewî ya Koçberiyê (IOM) bikin.
  - Bijareya 3yê: Hûn karin daxwaza alîkariyê bikin, heta eger ku nexwazin pêşqeydkirinê bikin. Di vê rewşê de, bi karmendên li odeya rawestanê biaxivin. Ew karin ji were bêjin ka mercên alîkarîyê çi ne û hûn li ku derê karin alîkariyê bistînin.

Gava 3yê : Beşa pêşwazîyê

- Divê hemû endamên malbatê bi hev re biçin beşa pêşwazîyê.
- Yek ji endamên koma pêşqeydîyê dê barkoda heyî ya li ser bazinê we ye bide xwandin û dê nîşaneka reş li ser rûyên nazina we û hemû malbata we bikşîne. Maneya vê ew e ku hûn ji bo pêşqeydîyê hatine û kesekî din nikare bazinê we bi kar bîne. Li gel vê, ew dê nav û nivîsa we polîsî kontrol bikin. Eger pirs an teşqele hebin, ew ê we bişînin kursîyekî, û li vê derê kesekî din heye ku çareyekê peyda bike.
- Paşê, divê hûn li odeya rawestanê ya didoyê de bisekinin.
- Dema ku hûn li bendê ne, endamên komê dê ji we re zelal bikin ka pêşqeydkirin çawa pêş diçe û piştî bidawîhatina proseyê erk û mafên we çi ne.
- Dema ku dora we bê, dê yek ji endamên komê bi we re têkilî bike û we ji bo hevpeyvînê bîne.

HELLENIC REPUBLIC
Ministry of Interior and Administrative Reform

Asylum Service

Gava 4ê Têavêtina agahiyan

- Karkerekî pêşqeydkirinê dê ji we bixwaze hûnagahiyên xwe yên hîmî li ser xwe radest bikin û ew ê van agahîyan li ser komputerê qeyd dike. Ev agahî ji nav, temen, netewe, hejmara telefona we û hwd pêk. Karkerê pêşqeydîyê dê van agahîyan ji bo tevahîya endamên malbatê tomar bike. Eger ji bo piştrastkirina van agahîyan belgeyên we yên fermî hebin,, divê hûn wan jî nîşan bidin. Wek nimûne, paseport, nasname, belgeya zewacê û hwd. Ji kerema xwe bersiva hemû pirsan bi awayek rast pêşkêş bikin û tu agahîyên hûn difikirin girîng in, ji bîr nekin.

- Di maweya hemû axaftinan de dê wergêrekî devkî bi we re be. Eger hûn ji pirsekê tê negihîştin, yan eger tu piştrast nînî ka dayîna bersiva pirsan çawa dibe, divê ji berpirsê pêşqeydkirinê re bibêjin.

- Karkerên pêşqeydîyê dê agahiyên we li gel agahîyên di nav bingeha polîsan ku li dema wergirtina nivîsên polîsan hatine qeyd kirin bide ber hev.

- Di dema pêşqeydkirinê de tu biryar li ser rûniştina we li Yewnanistanê nayê derkirin. Ev mijar dê di rojeka din de bê diyarkirin.

- Eger endamên maltabata we yên nêzîk (mêr/jin an jî zarokekî di bin temenê 18 salan de) yê bi awayekî qanûnî di welatekî Ewropî de dijî hebe, divê di dema hevpeyvînê de behsa wî/wê bikî. Divê ji bo alîkarîkirina bi piştrastkirina gotinên we re, hûn belgeyan pêşkêş bikin.

- Eger temenê we di binê 18 salan de be û hûn digel dê yan jî bavê xwe nehatibin, ji kerema xwe babetê ji berpirsê pêşqeydîyê re ragihîne. Herwisa divê ji wî/wê re bêjin ka qet endamên malbata we di welatekî Ewropayê da hene an na. Teqez divê tu temenê xwe rast bêjî.

- Eger hûn ji welatên Sûriye, Îraq, Komara Navendîya Efrîqayê, Erîtreyê, Bûrûndîyê, Kostarîkayê, Saintvinsentê û giravên Grenadînê, Behreynê, Maldîvê an welatên li derveyê herêma Brîtanyayê tên, karin di bernameya veguhestina Ewropî de beşdar bibin. Di vê rewşê de divê ji berpirsê pêşqeydîyê re bêjî ka di vê maweyê de ku daxwaza penaberîya we di welatekî Ewropî yê din de lê tê kolan , hûn hez dikin ku di vî welatî de bijîn an na. Lêbelê, çi misogerîyek tune ye ku hûn werin guhestin û **nikarin welatekî hilbijêrin**. Lîsteya neteweyên karin beşdarî bernameya veguhestinê bibin di meha Temûzê de dê bê guhertin. Ne diyar e ka çi netewe dê li lîsteyê bên zêdekirin an jîjê bên rakirin.

- Karkerên pêşqeydîyê dê li ser sebebên daxwaza we ya penaberîyê hin pirsên kin bikin.. Ev dê di rojek dî da pêk bê. Hûn ê bi rêya peyama ji hejmara telefona we ji me standî re bê şandin, rojekê ji bo hevdîtina digel xizmetên penaberan werbigirin. Ev peyam, piştî bidawîhatina tevahîya pêşqeydîyê li hemû cihan, dibe ku di dawîya Temûzê de, dê were şandin. Bi awayekî serwext beşdarbûna dema hevdîtinê pir giring e. **Eger hûn nekarin di vê demê de beşdar bin, divê hûn ji bo hevdîtinê bi rêya Skype-ê demeke nû bidin xuyandin û tevahîya proseyê ji nû dest pê bikin.**

- Eger pirsên we yên din hebin, karkerê pêşqeydîyê dê ji we an endamekî malbata we bixwaze ku ji tîmê digel endamekî din li ser maseyeka din biaxivin.

- Karmendê pêşqeydîyê dêê wêneyê tevahîya endamên malbata we bigire. Nabe serpûş, kum û berçavik rûyê we weşêre.

HELLENIC REPUBLIC
Ministry of Interior and Administrative Reform

Asylum Service

Gava 5ê Karta penaberiya we

- Piştî têavêtina agahîyan, hûn ê biçin odeya rawestanê ya sisêyê. Di dema lihêvîyêmayînê de, derpirsek ji xizmetên penaberan dê li agahîyên we binihêre, da ku lê bikole ka çi tişt ji bîra we neçûbe. Di vê rewşê de, ew ê alîkariya we bike ku hûn agahîyên xwe ava bikin.

- Berpirsek ji xizmetên penaberan dê karta we çap bike, gazî bike û ji we bixwaze hûn karta xwe îmze bikin. Her yek ji endamên malbatê kartekê werdigire. Divê ev kart her tim bi we re be. **Kartê wenda nekin, plastîkê nekişînin serê, tiştekî li serê nenivîsînn. Eger hûn vê karta xwe wenda bikin, kart ji we re ducarî nayê dayîn! Eger di dema hevdîtina pêşîyê de digel xizmetên penaberîyê ev kartbi we re nînbe, divê hûn ji bo hevdîtinê bi rêya Skype-ê demeke nû bidin xuyandin û tevahîya proseyê ji nû dest pê bikin!**

Gava 6ê Piştî pêşqeydîyê

- Eger we hemû gav derbas kiribin, di rastîyê de pêşqeydîya we temam bûye. Eger hûn li cihekî ku we pêşqeydê lê pêk anîye dijîn,, hûn niha karin biçin konên xwe.

- Eger hûn li cihekî din dijîn, divê hûn bi otobusê vegerin cihê xwe. Ji kerema xwe ji berpirsê UNHCRê bipirsin ka otobus di çi demê de û li ku derê radibe. Dibe bivê hûn demek bisekinin. Di dawiyê de, dema ku li otobûsê siwar bibin ji bo ku biçin cihê xwe, dê endamek koma me bazinê we veke.

- Dema ku hûn li benda otobusê ne, dê av ji we re bê pêşkêşkirin.

HELLENIC REPUBLIC
Ministry of Interior and Administrative Reform

Asylum Service

Gavên pêştir

- Dê xizmeta penaberîyê ji we re peyameka (SMS) bi dem û cîhê hevdîtina pêştir heye bişîne.. Ev peyam dê ji hejmara telefona we ji karmendê pêşqeydîyê standî re dê bê şandin. Dibe ku dema hevdîtina bi we re piştî çend mehên pêşqeydîyê dest pê bike. Ji ber ku bi hezaran penaberên di heman deme de ji penaberîya Yewnanistanê daxwaz peşkêş kirine henebRoja qerara hevdîtina pêşîyê ya we di nivîsîngeha xizmetên penaberan girêdayî bi sê tiştan e: 1) Dema gihîştina we ya Yewnanistanê, 2) Zimanê hûn pê diaxivin, û 3) we Ji bo penaberiya li Yewnanistanê, dubare hevdîtina bi malbatê an jî veguhestinê daxwaz pêşkêş kiribe.

- Hûn û hemû endamên malbata we, divê di hemû qerarên xwe yên hevdîtinê de li xizmeta penaberan bi hev re beşdar bibin.

- Eger hejmara we ya telefonê an jî navnîşana we bê guhertin, divê hûn navenda xizmeta penaberan agahdar bikin. Ev pir girîng e; ji ber ku dê berpirs digel we têkilîyê bikin û ji we re bêjin ka hûn ê çi demê serdana nivîsîngeha penaberan ya herêmî bikin. Divê hûn ji bo guhertina hejmara telefona xwe an navnîşanê serdana nêzîktirîn nivîsîngeha penaberan a herêmê bikin.

- Divê hûn teqez li ser wextê qerara xwe digel xizmeta penaberan beşdar bibin. **Eger di qerara hevdîtinê da beşdar nebin, divê hûn ji bo hevdîtinê bi rêka Skype-ê demeke nû bidin xuyandin û tevahîya proseyê ji nû ve bidin destpêkirin.** Li gel vê**, divê karta penaberîya xwe li hevdîtina pêşîyê digel xizmetên penaberîyê bi xwe re bînin. Eger hûn an yek ji endamên malbata we karta xwe neanîbin, divê bi rêka Skype+ê demeke nû bo hevdîtinê bidin xuyandin û tevahîya proseyê ji nû dest pê bikin.**

  Eger li ser veguhestinê pirseka we hebe, hûn karin ji bo bidestanîna agahîyên bêtir gel hêla telefona EASOyê têkilî bikin. Eger hûn li başûrê Yewnanistanê (nêzîkî Atînayê) dijîn, ji hejmara +30 69 44 82 91 38-ê têkilî bikin. Eger hûn li bakurê Yewnanistanê (nêzîkî Thessalonikê) dijîn, digel hejmara +30 69 89 76 45 98-ê têkilî bikin. Ev rêyên telefonê ji roja Duşemê heta Înê ji dema 9:00ê heta 17:00ê vekirî ne.

- Mafê we yê axaftina digel UNHCR-ê an rêxistinênalîkariyên hiqûqî, sihhetî û psîkologîkî pêşkêş dikin her tim heye.